Dosiyake taybet li dor kêşa Kerkûkê

Berhevkirin: Loqman Asîhî

Pêşgotin

Belku carek din jî me bi çîroka Mam Zeyno dest bi bisata doza Kerkûkê kiriye, vê carê jî me wisa li bere:

Li gundekî ji gundên başûrê Kurdistanê ku dibêjnê Dergela Şêxa, kalemêrek hebû digotinê Mamê Zeyno. Jiyê wî ji 70 salan derbaz bûbû û bi gopal bi rê ve diçû, lê zimanê wî hê weka yê xortekî çardeh salî kar dikir. Gundiyan digot: Li destpêka şoreşa Eylula mezin dema ku pêşmerge ji nû dihatin gund û li malan belav dibûn û dema caran dengûbasên şerên wan jî digehiştin, me tevan kêf pê dihat, tenê Mamê Zeyno nebe ku gelek ji ruha xwe ditirsa. Dema dengê firokeyan dihat gund û çiyayê li hindavî gund jî bi hemû şkeftên xwe ve lê dibûn qapûşkê kezwanê. Gelek caran paşçûna firokeyan dipirsî: Mele Mistefa û leşkerê wî ji bo çi vî şerî dikin? Gundî jî hîn bûbûn û digotinê, ji bona nefta Kerkûkê dikin! Û wî jî dîsan weku hemû caran digot: "Nê tenekeyeka neftê bo hemû salê têra çirayê me heye, ev şerê dihê kirin zêde ye!"

Îro pitir ji 45 salan di ser gotinên Mamê Zeyno re derbaz bûne, lê hê şer (xebat) ji bo Kerkûkê berdewame, ji bo Kerkûkê ne tenê weku bajarekî dewlemend bi nefta xwe lê ji ber ku bajarekî Kurdistanî ye û pitiriya xelkê wî

kurd in û dîroka wê jî vê yekê tekez dike.

Ev bajar her dem cihê nakokiyê bûye di navbera hikumetên Îraqê û tevgera rizgarîxwaza gelê kurd de. Ji ber ku hemû caran aliyê hikumetê bi çavekê aboriyê hişk li vî bajarî dinêrî û rê nedida gengeşe li dor bihê kirin li gel aliyê kurd ku li bajarî dinêrî wek parçeyek ji Kurdistanê bi xelk û erd û neft ve ku pêdiviye vegere ser erdê Kurdistanê û belku ev helwîstê kurdan û mukiriya wan li ser kurdîtiya Kerkûkê bûye sedemê dirêjbûna jiyê şoreşên kurdan ku her dem nexwastine dev ji Kerkûkê berdin.

Paş jinavçûna rijêma Beis li Îraqê ku destekê bala di guhorîna tobografiya Kerkûkê de hebû, aliyên siyasiyên kurd karîn du madeyan sebaret Kerkûkê bi dest xwe ve bihînin, madeya jimare 58-a qanûna Îraqê ku li serdemê veguhastinê bû. Paşan û weku dirêjîpêdana wê madeyê di destûrê her demkî yê Îraqê de madeya 140 hate pesendkirin û li gel hemû madeyên dî 80% ji xelkê Îraqê razîbûna xwe li dor wî destûrî diyar kir ku pêdiviye li 13/12/2007-ê ew madeye ku 140-e bi hemû hûrdekariyên xwe ve bihê bi cihanîn.

Di vê jimareya kovara Nûbûn de me hewl daye hinekê ji nêzîk li ser rewşa vî bajarî rabiwestin û ji gelek aliyan ve. Dîsan hewil hatiye dayîn ku bersiv li ser hinek pirsiyarên hilawîstî jî bihên dan û ka bi cihanîna madeya 140-ê di çi qûnaxê de ye ew jî rexeke ji vê tewerê. Li aliyekî din jî bizav hatiye kirin ku rolê dewleta tirk jî di vê mijarê de bihête naskirin û çend pênûsek di vê tewerê de pişkdarin:

- Dr. Zirar Sedîq, kolîja edabê zankoya Duhokê
- Hişyar Silêvanî, şareza di warê aborî de
- Mesûd Batêlî, kolîja yasayê / zankoya Duhokê
- Fehmî Mele Mihemed, endamê mekteba siyasiya hizba rizgarî Kurdistanê
- Seadedîn Yûsif, endamê liqa 8 Partî Dîmokratî Kurdistan
- Ubeyid Hesen, Ekadîmya leşkerî li Zaxo
- Ehmed Miho Hecî
- Mamosta Fazil Ebas Elî
- Qadir Azîz, di dîdarekî de bo Nûbûn